

HEJMAR

18

%100
KURDÎ

pîne

"AŞTÎ DI BIN LINGÊ DAYIKAN DE YE L.."

KOVARA QERFÎ Û WÊJYÎ



kovara qerfî û wêjeyî ya nîv mehî

16-31 temmuz (fîrmeh) 2000

Sayı: 18

500.000 TL

WASWASEYA
ECEWÎT KENÊ
GURAN TÎNE!..

Ecewît ji ber têkiliya
HADEP û CHP'yê, gef li
CHP'yê xwarin!..

MIN BIHÎST KU
HINEKAN HÊ JÎ TÊKILIYA
XWE BI VAN TERORÎSTAN
RE QUT NEKIRIYE

ANNE!..



KÎ DÎN KÎ BAQIL E!..

Bi taybetî, li her gundî, dîn, delodîn an jî deqerû hene. Dema gundî li hev dicivin, şevbûhêrk û dembuhêrkan digerin. Li her civatê dîn an jî deqerûyek peyda dibe. Êdî her kes tinaz û henekê xwe bi wî/wê dînî/ê dike. Civat digere; geş û xweş dibe. Ji ber ku mirovên "sergiran û maqul" nikarin civatê geş bikin û berê xwe didin dîn û deqerûyan!..Baş e, çima?

Lewre dîn azad e!.. Deqerû ye! Tiştêkî jê bemade!.. Tiştên ku civat nikare bêje, bê tirs û xof dibêje dîn. Lê civat an jî "mirovê bîaqil (?) dînî ne, fismirî ne, agirê bin kayê ne!.. A dilê xwe piştî civatê peya dikin. Dil û dilistana wan tarûmar bûye. Ew mirovên "giran û cidî" ne. Ji ber ku ew bi "biv û ciz e" mezin bûne!..

Dema dîn ji civatê vediqete, civat jî hêdî hêdî tamsarkî û tisî dibe!.. Lewma jî hêdî hêdî belav dibe. Karê her kesî tê bîra wan. Dema bi tena serê xwe dimînin ken û qerf rûyê xwe ji civatê badide!.. Ma wê çi bike, di nava mirovên "giran û cidî" de!..

Va ye Kemal Sûnal jî, dîn û deqerûyê kurd û tirkên jî, berê xwe da rîya nehatê!.. (Nebêjin dîsa Kemal Sûnal, emê jî binivîsin, ma em ji jinbavê ne!) Civak di rastiye de li ber xwe dikeve!.. Ma wê çawa latan bigerîne!.. "Dembûhêrkê nigaşî (sanal sohbetler)" nema digerin!..

Civak li ber xwe dikeve, lewre "zarokê nav wê" ji dest da. Yê ku her dem rastiye dibêje!..

Wekî din, yek jî, ji bo ku me li cem wî xwe bêhtir bîaqil û aqilmend dihesiband, me ji wî hez kir!.. Kêfa me jê re dihat, lewre mirovê kêmaqil û ne jêhatî, ji xwe re li mirovên ji wan kêmaqiltir û qelstir digerin, da ku xwe xurtir û bi hêztir bibin. Lê xurtî û hêzdariyeke derewîn e!.. Kî dîn e, kî bîaqil e ne diyar e!..

Gelo medya çima wisa hêstiran dibarîne û dide barandin? Hestfiroşî û girîfiroşiyê dike? Hûn jî pê zanin, hin kes, bi pereyan şîne dikin û zêmaran(ağt) dibêjin; karê wan ev e. Medya jî şînfiroş e!..

Dawiya dawîn û rastiya rastîn, gelo em li ber Şaban ketin an li ber Kemal Sunal ketin?!.. Û tiştêkî din, hin tiştên me nikaribû li dijî serdestan bigota, wî digot!..


Delalno, (cigare êdî ji bo tendirustiyê baş e) Kermêş jî qedexê bû. Qet xeman nexwin!.. Rahêjin Sator û Tizbiyê xwe li hêviya me bisekinin!.. (Kuro şaş fêm nekin ha, em di pêvajoya aştiyê de ne!..).



Dozo

KA BINÊRIN, GELEKÎ XWEŞİK E JÎ!.. EM DIKARIN XWEDÎ BIKIN! HEM WÊ LI MALÊ MIŞKAN NEHEWÎNE!

NA DOZO! JIXWE LI MALA ME MIŞK TUNENE!..



BİREBİR



Turkcell kete Borsaya New Yorkê!



Esref 2

MIJARA BERGÊ

Mûrat Dîl, ku ji ber sersariya dewletê, li girtîgehê nehatibû tedawîkirin, jiyana xwe ji dest da!



Necmettîn Erbakan jî ji ber ku qala kurdan kir salek ceza lê hate birin.

SARSAR



Ji bo Nadîre Mater û weşangerê wê Semîh Sokmen ji ber "Pirtûka Memed" 12 sal ceza tê xwestin.




"Nataşa" li Qersê jî qewimîn, loma axur ji bo "karê şevê" hatine veqetandin!

Daîreya Taybet a Şer tê betalkirin!



Kelagerma havînê avê li mirovan venaxwe!



BAFE.. BILA İÇA WISA BE. MA BÊ ME DİMEŞE?..



Kemal Sunal heneka xwe ya dawîn kir!



medenî ferho

TOTIRNE!

Taybetmendiya nivîskar, zimanzan û rewşenbîrên Ewropayê ew e ku evîndarên civînan in. Lewre, her hefte du nebin jî, yek civîna tirtireyî çêdibe. Ev nivîsa me jî, li ser evîna dawî ya zimanzanên kurd ên li Ewropayê ye. Şikir ji dana xwedê ku nexweşiya kurdên Başûrê Mezin bi me jî ketiye. Her roj diçe Dir- zadeyên me ku hinek ji wan li baxçeyên dêran, hinek ji wan li danheva çîlek û kolana ber dadmêweyan doktora xwe ya ziman didin. Lewre dema dikevîne nava gengeşiya ziman de, xwe dispêrin 4 cureyên bingehîn.

Bi hejmarên roma I: Ev gotin herêmkî ye.. Bi hejmarê roma II: Ev gotin çêkiriye.. III Ev gotin ne li gorî şablonên min hatiye afirandin. Û IV: Ev gotin feodalî ye.. Bi stuyê şikestî min jî mafê axaftinê stand û got: "Gotinên kurdî bi giştî ji dema feodalî û berfêr mane.. Gelo emê çawa van gotinan hemdemî bikin?"

Keko birawo, Dir-zadeyên me ji kel rabûn û gotina min di devê min de badan; heya ku nequrmîçandin dev ji min bemedan. Ez di kêleka maseyê de pimisîm, lê zimanzanê Pirzan Melîkzade bi gotinên di nava peşkên tifê de pêçayî dest bi axaftinê kir:

- Li vê kesnediyê, di nûçeyan de jî dibêjin pîrek, ev şaş e, rastiya wê jin e. Dayîka min qet gotina pîrek bi kar ne dianî. Ku Xwedê jî ji banê jorf were, ez vê gotinê napejirînim.

Artistokratzadeyê Qamgaz, stikura xwe kişande qaşikê qemçika xwe û got:

- Ez jî gotina zikmakî napejirînim. Kî ne, çi kes in ku gotinan çêdikin? Pîrika min got, ew gotinên wê di pirtûkên felsefê de jî hene. Zarok ne di zikê dayikê de, li derî zikê dayikê fêrî ziman dibe.


DIR-zade Keskûnî, ku ji Amedê ye û di patikê sed bavê zimanê tirkî jî gane, ew zimanê ku hefsed safî Osmanîyan, piştî komara Tirkîyê ji kurdî, farişî, erebî û niha jî ji frensî berz û bi hêz dikin, kirine hundirê wê meşka ne ceftkirî, tev kirine "gidax, gelax, yapax, qirax, curax, yapîsen, gîdîsen, gelîsen, hindîsen, tawuxîsen, mirîşkîsen û qetil kirine" dest bi axaftinê kir:


-Ev çar salên min in ku ez li ser felsefa zimên, ekolojîstîka zimên kolanê dikim. Tevî ku min ji bo kurmançî hinek şablon amade kirine, kes bi ya min nake, lewre şaşî jî her roja diçe zêde dibin.

Torinê Mala Dîbo, Mala Sîno ku bi piştî heft bavên li ber kaba Emerê Gozê rûdinê û ez newêrim navê wî bidikirînim, bi edayeke giran:

-Gelek kesan ji wê heya îro yek nivîs bi kurdî ne nivîsiye, gelo hûn çawa li ser zimanê kurdî lêkolînan dikin? Guman dikim ku lêkolîna zimên, ne mîna kolana rez û werzan e. Her yekê ji we radibe, gotinên ji xwe mezintir dike. Çavkaniya hinekan ji we dayika wan e, ya hinekan ji we jî pîrika wan e. Gelo dayik û pîrikên we di Zanîngeha Oxford de xwendiyê? We civîn jî kire totimel..

Têbînî: Ji bo piştgiriya Kermêşê em li şûna nivîsa Rahmî Batur, nivîsa Medenî Ferho diweşînin.






Şêref Mumcu



ÊZING



- Sêwîyo. Kûçik mirov gez bike nûçe ye, ya mirov kûçik? Ji te re pirseke 10 puanî.
 - Abê ez bezê çavê te bibalêsim, dev ji pirs û bersiva berde, ka wê çawa be halê memleketê. Kekê Kemo çû rehetê, ew ekola zarokatiya me bû. Emê çihê wî çawa tijî bikin?
 - Navê wî **Kemal Sunal** e çavberano! Şebo navê bavê min e. Kuro nekene. An na tu kevir diavêji bavê min? Ezê hacetê te bixime diya te ha!
 - Abê qey min gû xwariye, kevir biavêjim bavê te ye hêja û ciwan? Li ser serê min tim "maseyêke rezerve" ji bo bavê te heye, ez xulam!
 - Hah wisa bêje! Sêwîyo di bêrika min de niv kîlo esrar heye. Ez dixwazim bifroşim Hesoyê Qesab. Lê li ber dikanê ereba polêsan heye. Wan oyalamiş bike! Te fêm kir?
 - Ez çawa oyalamiş bikim?
 - A ji te re vê pankartê di bere wan re here. Biqire, bêje bijî Kurdistan!..Okey!..
 - Abê min neşewitîne, qeymiş min neke! Gilêza devê te bibalêsim!..
 - Kuro gava ku me bêrika xwe tijî kir, ezê te bibim Aksarayê 2 heb keçê Moldovayê ji te re eyarlamîş bikim. Û hetanî Xwedê da me, emê alem bikin.
 - Lê qereqol û nezaret û îşkence?
 - Ezê te derxim lo! Xem nake! Hadê hadê gula min. Ez birakê xwe bibinim ka çî mîrekî egiê e!



KEREM KE!

ERTÛG SONMEZ

GER HÛN DIXWAZIN DEV JI CIXAREYÊ BERDIN...!

Sînga min êşîya, ez çûm ser doktor, got: **bronşît** e, dev ji cixareyê berde!

Zîkê min êşîya, ez çûm ser doktor, got: **ulser** e, dev ji cixareyê berde!

Diranên min êşîyan, ez çûm ser doktor, got: pidiyê diranên te dadikevin, dev ji cixareyê berde!

Axirkê! Min berê xwe bi ku de kir, hemûyan gotin dev ji cixareyê berde. Min jî hefteya berê dev ji cixareyê berda.

Du-sê rojên pêşî pir xweş çûn. Bi dendik û mendik, cerez û merez û benîşt û menîştan min baş îdare kir.

Di vê navberê de televîzyona me xerab bûbû, me biribû ser sazkerê TV'yê, da ku çêbibe. Piştî sê rojan televîzyona me saxlem hat malê.

Wele ev serê sê-çar rojan bû ku min li televîzyonê temaşê nekiribû. Hema yekser min kablo-mabloyên televîzyonê bi hev ve û bi dîwar ve û fîşan ve girêdan. Û min got "bismilla!" û min televîzyona xwe vekir. Ez pir jî meraq dikim, gelo di navbera van sê-çar rojên bêtelevîzyonê de, li Tirkîyê çi qewimiyê, çi neqewimiyê!..

Belê min televîzyona xwe vekir, kanalên tirkî: startar, tgrt-mgrt, trt-mrt int û hê gelekên din. Min hemû li bin guhê hev xistin. Û min nihêrt û nihêrt û nihêrt û nihêrt û...!

Û ew axifin, ez hêrs bûm! Wan got û ez hêrs bûm!

Serokwezîrê tirkîyan tiştê got, ji hêrsa kela min a cixareyê rabû!

Serokleşkerê wan tiştê got, ji hêrsa kela min a cixareyê rabû!

Wezîrên wan ên pûç û mûç hin tiştê gotin, ji hêrsa kela min a cixareyê rabû!

Û welleh, hema ez çûm derve û min pakêtek cixare kir!

Ger hûn dixwazin dev ji cixareyê berdî, divê ku hûn get li televîzyonên tirkîyan nenihêrin û temaşê nekin!

WELAT DIYA KÊ YE!

Di eskeriya tirkîyan de qomutan ji yekî ku navê wî Erol e, dipirse:

- Welat çi ye?
- Namûsa min e, diya min e.
- Aferîn!

Îcar berê xwe dide yê kurd û dipirse:

- Welat çi ye?
- Namûs û diya Erol e!



LOZIN




Haydar IŞIK

YASAX!..

Eke yew kurd bi beqçî, hemû kes ra zêde qîseya yasax ano ziwan. Coka karkerê kurdan kenê beqçî. Almanya de xeylê kurdî beqçiyin kenê. Verê banka û fabrikayan de însan niyadeno ke ûnforma kerda pay û fetelinê.

Uza fabrîka pawenê, eke kinconê xo ke vejenê û sonê demonstrasyon uza jî xeletiyê kenê. Eke jû (zû) rey vanê "Bijî Serok Apo" polîsê alman eve kamera rewşî tespît kenê, hîrê sey mark çeza danê înan. Eke di rey vanê, "Bijî Serok Apo" ceza bena şeş sey mark. Eke hîrê rey vanê ceza beno b e r z .



Polîsan het-anî 2500 mark jî ceza dayo tayê karkeranê kurdan.

Ez bawera cezayê niyanên ke ma dame dewleta alman, şiyoro welatê ma, uza xizanîn kewna dûrî û welat îhya beno. Nika coka camêrdê zimbêl verdanê ke polîs nêvînê. Kamera polîs fekê mileta ma niyadeno. Kam ke fekê xo akerd 300 mark.

Mi jî hetanî nika xeylê ceza anto. Nika ez fekê xo nêakena, yan jî fekê xo destê xoya racenena (cen). Nika na ceza eyaleta Bavyera de zêde zêde yena meydan. Polîsê îtay û polîsê Amedî zey jûbîn manenê pê û kes şeno vajo birayê jûbînê. Kurdê tiya Bavyera vanê 'OHAL Bolgesiya'.

Nika iyê hinî pirtûk jî kenê top. Yasax esto, sansur esto, jiyana ma verê çimanê înan de biyo koyê Cûdî. Qahriyenê, ma ra hes nêkenê. Coka jî erzenê (çekenê) tever û rusnenê îşkence.

Eke qîsa kurdan biyaro goşê wezîrê polîs, benê bom û porê xo ancenê. Coka paranoya ra nêweşê. Ez bawera eke kurdî her roj vajê, "Bijî Serok Apo" siyasetkarê almanan ra êqel benê dûr.

Xezên Berêdayî

Muab SER




ELETEWŞ

Sefer SELVÎ



CAWKÊ XEZAN



MEHMÛD BAKSÎ

DÎKÊ MELE YASÎN

Mele Yasîn zehf ji mirîşkan hez dikir, ji bo wî goşt mirîşkan ji her goştî xwestir bû. Ji bo vê yekê jî di hewzê wî de ji sed mirîşkî kêmtir tunebû. Sê çar heb koxikên vî yê mirîşkan hebûn; wekî ronîka çavên xwe li wan mêtir dikir.


Lê çî hikmet bû ez nizanîm, bi tenê dîkekî wî hebû. Ev dîk jî pir bi nav û deng bû. Wî dikarî ji sed mirîşkan rî mêraniyê bike. Tişteki wisa di warê Xerzan de nehatibû seh kirin. Ji ber vê yekê jî gelek caran gundî dihatin ji Mele Yasîn rica dikirin ku dîkê xwe bi deyn bide wan, da ku ji bo çend rojan (bêmane) berde ser mirîşkên xwe.

Mele jî bi hezar nazîyan ji bo çend rojan dîkê xwe dida wan. Tabî bi çûyîna dîko, bêmane, li ser mirîşkan, mirîşk her ku diçû zêde dibûn. Roj û dem derbas bûn û dîkê me jî quwet ket. Rojek ji rojan dîkê me berê xwe da Mele Yasîn û jê re wisa got:

- Seyda! Bi Qurana ku te xwendî hal û mesele ev e. Tu dibînî êdî ez di nav salan ve çûme û heba diranan di destê min de nemaye. Bi nav û ismê xwedê, ez di heqê sed mirîşkan de demakevim. Ew mirîşkên bêdebe, har bûne devê koxikê ji min re digirin û nahêlin ku ez ji koxikê derkevim. Îcar ji xêra dê û bavê xwe re here dîkekî din bikire, da ku barê min jî sivik bibe. Bila were car caran



Cem Şeker
ŞEKIRÊ QU



arîkariya min bike, ku em vî işî(!) bi hev re bimesînin (mele nefîkire ku ez pêzeweng im).

Mele Yaşîn biçekî bêhna xwe teng dike, filan û bêvan. Dibêje dîk, "êdî tu ziktêr bûyî û pozê te bilind bûye û tu hazîyan li min dîkî filan û bêvan" lê dîsa jî guhê xwe dide dîk û diçe bazarê dîkekî mezin dibîne û dibêje, "tu zanibî quwet bi qedrê Xwedê ev dîk baş e. Ezê wî bibim, ew û dîkê min bibin yek. Wê jî derheqê ne 100 belkî 500 mirîşkan jî derkevin."

Neysel melayê min û te pere dide û dîk dikire û tîne, berdide nav mirîşkan. Du roj sê roj naçe, li hewşa xwe li mirîşkan re dinêre ku çi heye çi tune!



Diçe ku dîkê Mele Yaşîn pepûko tê pêşîya taqê, her du bask û perên xwe wisa bilind kirîye, çavek wî girtî, çavêkî wî jî vekirîye. Di xew de ye. Gava ku mele dibîne, dijwaze ku çavê xwe yê din jî veke, lê bêhal e. Wî gava ku mele didît bi ber de bazdida diçû, dihat filan. Lê vê tarê qet jî cihê xwe jî ranebû. Gava ku mele hate cem got, ev çî qas dîkekî bê terbiye û bê edeb e, ji ber min ve ranabe û pehînek lê xist û got:

- De rabe dîkê pîsê heram, tu çawa li ber seyda ranabî!.. Wê çavên te kor bibin. Ma çi bûye, me çû dîk jî anî lawo, ka bêje tu dawa çi dîk?

Dîk got, "seyda ez bi Quranê kim, ew dîkê ku te wê rojê anî ew qûnek derket, barê min giran bûye, te malik li xwe şewitandî heyran, hê ku ez nemirime û bi AIDS'ê neketimê wî bibe! Tu dizanî ez ditîrsim ez bi AIDS'ê bikevim. Çimku ew qûnek, zehf bi dora dîk û mîkên xelkê de hatiye û çûye, bi xêra xwe tu wî bibe here. Heyran ez bi halê xwe razî me.


Îcar di siyasetê de jî pir caran hin xwe wekî dîkê Mele Yaşîn nîşan didin, lê tu ferq û cudahî di navbera wan û dîkê ku Mele Yaşîn kirbû de tune.

Têbînî: Nivîsa Cemîl Denlî negihîşt ber destê me. Lewma bo piştgiriya Kermêşê em nivîsa Mehmûd Baksî diweşînin.




MESH • BAO!

IMAM CICI



ZILITO



muratbatgi@hotmail.com

MURAD BATGI

GENÊN KURDAN JÎ DEŞÎFRE BÛNI..

Xwedê ji kesên ku şoreşa genan pêk aniye razî be, ku em dê bi saya wan êdî bi hêsanî bikaribin şexsiyetên xwe "çozumlemîş" bikin û bi cesaret, bi ser kêmasî û nexweşiyên xwe yên kesane û civakî de herin!..

Me jî bi saya îmkânên ku kovara me ya ne tenê qerfî, her wiha zanyarî, akademîk, pragmatîk, tragmatîk li laboratuwarên herî mezin ên Emerîkayê lêkolîn çêkir û me taybetiyên genên kurdan deşîfre kir.

Em gihîştin encameke gelek balkêş:

Mînak; Xwîn di nav damarên kurdan de nagere, damar di nav xwînê de digerin. Rih di nav laşê kurdan de nîn e, laş di nav rihê kurdan de ye. Kurd lingê xwe naxine solan, solan dixin bin lingê xwe.

Yanî di serî de, di çêkirinê de hin şaşî hene... Dema ku rewş ev be, her tişt ser-obino dibe... Yanî kurd jî dilşadiyê na, jî êşkişandinê, jî jiyânê na, jî mirinê, jî xwe na, jî neyarên xwe hez dikin!..

Em jî dixwazin taybetiyên van genan rêz bikin;

Di nav genên kurdan de ji sedî heftê tenê axaftin, ji sedî heştê bişaftin, ji sedî dused reva ji welêt, ji sedî heştê û pênc ziman û çanda xelkê heye.

Di nav genên kurdan de tenê ji sedî panzde evîna welêt heye. Her wiha ji sedî nod stranên **Ciwan Haco**, ji sedî sisê û nîv jî bemameya **Sêla Sor** bi cih bûye.

Di nav genên kurdan de ji sedî pênc "özeleşîrî", ji sedî nod û pênc "eleştîrî" bi cih bûye. Wekî din, ji sedî heştê "boşa çikarma", ji sedî çar kollektivîzm bi cih bûye.

Di nav genên kurdan de ji sedî heştê daxwaza civînê, ji sedî pazde jî ji civînan rev bi cih bûye.

Di nav genên kurdan de ji sedî nod hewesa keçrevandinê heye.

Di nav genên kurdan de **gena birakujiyê** gena herî xurt e û gena demokrasiyê jî gena herî qels e. Di nav genên kurdan de ji sedî nod û heft eşîrtî heye.

Di nav genên kurdan de ji Pîne û zan-yariyê re cih nemaye. Her wiha gena xwendin û nivîsandinê jî wînda bûye.

(Li gorî vê taybetiyê, bi ihtimaleke mezin **Medenî Ferho** û **Mahmût Baksî** ne kurd in.)


Ka gelo em dê çawa ji van genên xwe yên nebaş xelas bibin. Wellehî heta em fêrî "genreşîya" nebin, em dê wisa bi "genreşiyê" bijîn.

Jêrenot: Ji bo ku ez li ser genên **Cahî Merwan** û **Medenî Ferho** bi awayekî zanistî û kâr û dâr rawestim, ji bo çend hefteyan ez dê herime Ewropayê. **Înşallah** ji bo gelê kurd em dê bi nûçeyên xêrê vegerin.

ZILITO

REWŞA WÎ REWŞA KERÊ NÊR'E

Camel





camerfiraxsho@hotmail.com



Ez pir Ji te hez dikim! Evîna min!..



Gava tenêti, di dilê mirov de cih digire, mîna kerê mîkera xwe wînda kiri, doşehêk di dilê mirov de dizire!..

Delalê dilê min!.. Ez jî pir ji te hez dikim! Em qet hev bernedin!




Karxezala min!.. Rast e, bi hev re bûna me "me xurt dike"

Sibêtirê, di sê em hev du bi bînin. Telyayî here, bilê kes te nebîne!..



Gimê li hemberî min wîsa dilzinarî? Dema tu bersivê evîna min nêdî, dibê qey, bêwestan û rawestan, serejêr, dikevim bîreke bîbînî!..



BINÊR, EV NE WISA YE!.. EVÎN, BI TENÊ, NE DIYARKIRINA WÊ YE!..

Bi vî awayî, her ku çû tuyê bêhtir bengî bi bî!.. Ger li dawiyê, eşûjan hebe, yê ku wê pê bihesî tuyî!..



EW ÇI YE?

Serê biharê ye. Dinya germ e. Mêrikê ciwan, cotê gayê wî di ber de, zewiyê xwe yê biçûk cot dike. Bêhna biharê ketiye erdê. Her ku erd diqelîşe, bêhna axê tev li bêhna kulfikên biharê dibe.

Mêrik di nava xeyalên pêserojê de cotê xwe kûr diajo. Wê rojê kurikê xwe yî 3-4 salî jî, bi xwe re aniye nav zewiyê û kurik li binê darekê daye rûniştandin. Kurik jî ji xwe re bi kevîrên di dawa kirasê xwe de dilîze.

Li wî seriyê zewiyê, leglegê çîp dirêj li ser dara tûya reşik, ji xwe re hêlînek çêkiriye. Leqleya Leglegê ye. Yek caran bi nikulê xwe yê dirêj, binê baskên xwe dixurîne. Çavê kurik bi reşahiya li ser darê dikeve, ji bavê xwe dipirse:

- Bavo ew çî ye?
- Kurê min ew legleg e.

Mêrik diçe seriyê din ê xetê û vedigere. Kurik dîsa dipirse.

- Bavo ew çî ye?
- Legleg e kurê min.

Mêrik dîsa diçe û tê.

- Bavo Legleg çî ye?
- Leglegê, teyreke çîp dirêj e, nikul sor e, kurê min.

Mêrik cotê xwe digêrîne. Ji wî serê xetê vedigere.

- Bavo ew çî ye?

Mêrik cotê xwe betal dike. Lêwîk hambêz dike û wî dibe binê dara tûya reşik û ji nêz ve leglegê nîşanî wî dide.

- Kurê min, legleg teyreki çîp dirêj î nikul sor e. Her ku bihar tê û dinya germ dibe, legleg jî ji welatê jêr, tene welatê me û hêlîna xwe li cihên bilind çêdikin.

Di vê navberê de gelek sal derbas dibin. Mêrik kal dibe, ronîya çavên wî kêr, guhên wî giran dibin. Kurikê biçûk bûye zilamekî xurt. Dîsa bihar e. Kurikê bûye zilam, di nava heman zewiyê de cot dike. Bavê xwe yê kal li binê darê daye rûniştandin. Li wî seriyê zewiyê, li ser dara tûya reşik reşahiyekek bi ber çavê kalo dikeve. Kalo dipirse:

- Kurê min ew reşahî çî ye?
- Legleg e bavo.

Kalo rind nabihîze, pirsê dubare dike.

- Te got ew çî ye kurê min?

Kurik hêrs dibe.

- Ma tu kor î, tu ker î. Legleg e, legleg...

Ji çavên mêrikê kal hêstir dadiwerive xwarê. Bûyera wî û leglegê ya biçûkatiya kurik dikeve bîrê. Û ji kurê xwe re behsa bûyerê dike.

Ji me dipirsin, "Kurd çî dixwazin?" Me bi sebra bavê kurik got, nebû. Me bi bêhnatengiya kurik got, nebû.

Karê me, ne karê sebrê û bêsebrê ye. Karê baweriyê, karê xebatê û karê zanistê ye.



ŞOFÊR

Revhat Arslan



QONANS

EW EHMEQÊ KU
JI CANGORE MEYDANÊ
DIXWAZE, KÎ YE?
LÊXIN!..



Dêbidome

Pencereya Peyvê



EHMED HUSEYNÎ

1
Ji bo Mûrad Batgî:

Pêwîst e bîna genî ya diranê kurmî yê peyva kurdî bi xeyalê bête derman kirin.

2

Nivîsa ku bi şeweyekî sade û bi wateyê vekirî, bêyî ku bikaribe bejna efsanewî ya zimên ragihîne xwendevanê xwe, ew nivîs, di serencama dawîn de, xwendevanê xwe beşdarî têramandin û li ser rawestanê nake; hiş û bîra wî, têgihîstin û peywendiya wî ya bi dîrokê re lawaztir û sadetir dike.

3

Hêz û şiyana ku di kurmanciyê de veşartîne, hêz û şiyane mezin û berfireh in. Pêwîst e em wan ji zindanê derînin, rizgar bikin. Pêwîst e em zimanê xwe ji toza dîrokê dawêşînin, ji nav pencên dirindane yên asimilasyonê azad bikin. Pêwîst e em tîna dîrokî ya zimanê xwe bi ava afirandinê bişikînin, hewl bidin ku zimanê xwe bi wateyê, bi spehîbûnê, bi xewnê, bi arezû û hestdariyê bixemilînin.

4

Kurmanciya ku zaravayek ji zaravayên kurdî ye, ji bo kurmancîaxêvan hoker û regezêk ji regezên hebûnê ye (ango wekî ku Haydger dibêje "xaniyê bûneweriyê" ye).

Bi alîkariya zimên, hişmendiya mirovan dirust dibe û hem jî wijdanê wan, welatê mirov ê herî rasteqîn e ziman e. Mirovê ku zimanekî ji bilî zimanê neteweya xwe bi kar bîne, mirovekî mişext û heta hetayê bêgane ye.


5


Dema ku ez dest bi nivîsandinê dikim, dest bi nimêja xwe ya dawîn dikim, dest bi sersomî û sermestiya di laşê zimanekî sava û birîndar de dikim.

Mebesta min ne ku ez şoreşekê li dar bixim yan jî civatê rakim ser piyan, da ku poşman bibe. Mebesta min ew e ku şûnşopa dagirkeran ji ser hişê xwe rakim, xeyala xwe raperînim, bi dilsojî û bi velerzîneke destanî pêşwaziya Şêxê Senan û Nîşaniyê Botan bikim û li ser keviya mirinê, çîroka seferê bi rondikên êvara xwe nîgar bikim.

6

Hilgirtina pênuşê berpirsyaî ye, berpirsariyêke sincî (exlaqî) ye. Berpirsariya li hemberî zimanê neteweyekê ye. Rast e, îro ro kurmancîaxêvên ku hê jî di prosesa asimilasyonê de dijîn û perwerde dibin, dê nikarin çêjêke rasteqîne ji afirandineke rastîn wergirin, dê li deqên (text) hêsan û sade bigerin, da ku birîna xwe û têkçûna kesayetî û hiş û bîra xwe ji bîr bikin. Lê rojekê ji rojan, dema ku kurmancî bê ser hişê xwe û pêrgî laş û giyanê xwe bibe, dê bizanibe ku hemû deqên sade yên ku îro dîmena kurmanciyê dixemilînin, bi awayekî ji awayan, beşdarî tawanbarî û stemkariya dîrokê dibin.





namedank!..

BARANA HELBESTAN!..

Dema mirov dikeve nav wêjeya kurdî, helbest serê xwe bilind dike û dibêje: Ez tenê li meydane heme.

Her kesê ku hînî du gotinan dibe, ew bê şerm û fedî dibêje; helbestvanim û xwedî dîwan im.

Tu jê dipirsî: Te kengî dest bi nivîsandina helbestan kiriye.

Dibêje: Dema ez di zikê diya xwe de bûm, ez helbestvan bûm û dema ez ji dayik bûm hema ji giriyê min helbest jî diweşyan.

Tu ji yekî din re dibêjî: Tu kengî pê hesiyayî ku tu helbestvan î?

Dibêje: Dema destgirtiya min, dev ji min berda, ez tenê mam û tenêfî jî zor e. Hema ji qehra min helbest nivîsandin û ez bûme helbestvan...

Yekî din dibêje: Min çewale pîvaz dizî, polîsan ez birim girtîgehê. Îcar min ji xwe re got mirov dikeve girtîgehê dibe helbestvan, min pir caran bihîstiyê! Ma ew ji min çêtir in? Çi mirov helbestan li ser siyasetê binivîse çî li ser pîvazan be, herdu jî tiştên girîng in.

Tu dipirsî te Melê Cizirî xwendiyê? Dibêje na. Te Ehmedê Xanî xwendiyê? Na. Melê Batî, Cigerxwîn, Şêrko Bêkes, Evdîla Peşew, Jan Dost na, na... Ez ne hewcedarê wan tiştan im, ez di beroşa dilê xwe de gotinan dikêlînim û li ser sênikan (rûpelan) dirijînim, lê car caran gotin dişewitî, wisa xweştir dibel! Helbestên şewitî ji yê nîv kelf xweştir in; bi vî rengî sifreya wêjeya kurdî rengintir dibe.

Tu dîwana kîjanî ji van vedikî, gotinên tirs, tahl, bêtahm, eloberwatî tê de hene. Yek ji wan di helbesteke(?) xwe de dibêje:

Ji pozên pêlawa qedera reş
Ya bi firçeya împaratorê
Boyaxçyan
Hatîye biriqandin
Te diafirînim
Şev bi bêxewiya min re
Zewicî
Ez jî bi te re
Nezewicim!..

Hejmarên dîwanê helbestan ji hejmarên malbatên kurd bêtir bûne. Dîwanên helbestan pir dibin, lê helbestvan hin bi hin kêmbûn. Emê rojekê li wan bigerin jî û em wan peyda nakin.

Kurdîstana ku bi bilindiya çiyayên xwe navdar e, wê di demeke nêzik de bi bilindiya komên dîwanan bi nav û deng bibe.

Lê tirs ne ji vê ye, tirs ew e ku wekî kafiran û teyrên Ebabî li me were!.. Tê gotin di Quranê de ku di sala fîl de kevîr bi ser kafiran de bariyane...

Em jî ditirsîn rojekê, ew dîwanên helbestan bi ser me de bibarin, ji ber vê yekê jî em ji hemû (helbestvanan) dixwazin, heta ji wan we re rûpelên pirtûkên xwe tenik bikin, da ku Xwedê serê me ji vê barana ecêb bisitirîne.

JANA SEYDA

Jİ KUNDIRÊ RE NAMEYEK SERLÊDANÊ

Ez Eliyê Kundi, bêkar mame li hundir. Bêkarî karekî zor e gelfi hevala! Ma wisa nebûya, we li pişt qedexekirina Pîneyê, Zir Pîne û nîza- 'm çî Pîne derdixist!.. Hûn karê xwe bi xwe diafirînin. Lê ezê serkundi, tu kar ji min re nabe afir. Min serî li gelek keviran xist, ceriband ew û ev, wir û vir. Li gorî xwe min karek peyda nekir, lê xîreta min qet venamire.

Serpêhatiya min ev e: Ez di gulana bihara heftê û nehan de nêzikî Çiyayê Reş (Qerejdax) xwedê dam. Hê nû ji dayik bûbûm ku kundir û pîvaz di nav hev de biraştî, bi min dane xwarin, navê min danî Elî, Eliyê Kundi. Xwedêyo te digot qey, min ji bo roja îroyin amade dikin; pir miqayet dibûn!.. Îro ez dikarim kundirê xav jî bixwim (Ev niqta jî divê "artî puanek" be, ne wisa?). Min dibistana seratayî li Xanê kuta kir (Xan gundekî cîranê gundekî bi navê Kundirê ye. Ev rast e; gundekî bi vî navî heye û bi ser Erxenê ve ye). Dibistana navîn, min li Navçeyê qedand û ya amadehiyê û zanîngê jî li Stenbolê borand.

Min destûra ragihandin û televizyonê jî zanîngeheke navdar wergirt û di heman salê de di Shov TV'yê dest bi nûçegihaniya benameyên Teloweloyê kir. Pir neçû min dît ku ev kar ne li gorî madê min e. Ez di kovara Takîb-ul Alemînde wekî wên-wêþ, ê Feqîr-ul Bêcîla xebitîm. Dûre van bêcîlan jî devqa min birin, min got xatirê þima, ji we re kolayîk esta!.. Belê tu kar ne bi kêrî min nedihat birêz Hertiþ tê roj-namê, muxtarê Kundirê, kundir mundir pir bûn, lê kufikî bûn tevda. Cihêk nema ku min lê kar kir, lê min li Kundirê biryar kir!..

Rehme li dê û bavê guhdaran, wel-hesil, min di karê xwe de teþe girt, hew mabû zeng bigirta ku min hûn dîtî. Bi kurtî ez dixwazim di roj-nameya we de wekî nivîskarê quncik, hema quncikekî piçûk, kar bikim. Lê armanca min semîvîskari ye û ez xwe li gorî vî karê dijwar amade dikim. Ez dikarim wekî nunerê Enqerê jî bixebitîm (parantez îçinde). Bawer bikin birêz û xêz Kundirbaþî Feysel, wê rojnameya me baþtir û serþetir derkeve.

Ger serlêdana min hate pejirandin, ji kerema xwe re bersiveke vekirî, bi dora xwe zivkirî, wekî nanê qulqulî di kovarê de biweþînin. Bo miq-darê mizûrî, neyê bihna kizûrî, em dikarin hevdu bibînin, li qesra Walî, belê sahib-ul kundir Feyselê Çiyalî?

MEMO CAN

SILAV MAMOSTEYÊ MIN Ê CIWAN!..

Navê min Hêja ye. Ez xwendevanê we yê li benda hînbûna zimanê kurdî me. Bi rêberiya we ber bi hînbûnê ve diçim.

Ez di şeş saliya xwe de hînî zimanê tirkî bûm. Diya min bi tirkî nizanibû, lewma ez xwe zaf bisiûd dibînim. Piştî min dest bi dibistanê kir, zimanê min zêde xera bû. Min bi kurmançî delal xeber nedida. Lê ne ez ne jî yê ji min mezintir ne di ferqiyeta vê paşketinê bûn.

Îro hişê me hatiye serê me û em li zimanê dayika xwe xwedî derdikevin. Em nahêlin zimanê kurdî yê paqij û fireh, teng û bêmane bikin!..


Bi rastî ez zahfê caran li zimanê me şaş dibim. Piştî ewqas zehmetiyan, çawa gihîştîye vê rojê. Eger ne ji zimên bûya gelê kurd tune bûbû. Ji ber ku hebûna gelan, bi hebûna zimanê wan ve girêdayiye.

Em dizanin ku îro listikeke mezin li ser gelê kurd heye. Em jî naxwazin zimanê me yê delal, tune bibe û em zaftir lê xwedî derdikevin.

Ez ji xwendina Pîneyê zaf hez dikim. Ji ber ku zimanê min pêş dixê. Gava min pirtûkeke bi kurdî dixwend, min zaf jê fem nedikir. Piştî Pîneyê rehetir dikarim bixwînim û fem bikim. Ez hînî xwendinê bûbûm, lê min nikaribû fikirê xwe binivîsînim. Ev nameya min a ewil e ku bi kurmançî dinivîsînim. Min ev ji cesaret di hejmara Pîneyê ya 15'yê stand. Di nava remildankê de (nuhduduk) digot "Hevala hêja li gorî rapora sixura me, me bihist ku we dest bi hînbûna zimanê kurdî kiriye" bela ku navê min Hêja ye û ev demeke dirêj e, ez li ser zimanê kurdî disekînim min, ev hîtabê hilda serê xwe. Pêşî tîr kenîyam û ji kêfa hînbûna zimanê kurdî, min rahişt pênûsê û min dest bi nivîsandinê kir.

Ez ji mamoste xwe yê ewil dayika xwe û piştî televizyona me û ji mamostê xwe yê ciwan Pîneyê re spas dikim û dibêjim berî her tiştî kurd im ezê kurd bimînim!..

BATMANÎ



Xortim Silo dane karê pasif




ZAROKÊN ŞÛM Û NETEBAT!

Mîrze Mihemed derket!
Dixwaze bi we re bilize.

Mîrze Mihemed zora
POKEMONAN jî zora HÎMEN jî
dibe.

Ji Weşanên Welat bixwazin
Tel: (0-212) 251 90 13-
251 79 37



Kovara panzderojî (Onbeşgünlük Dergi)

■ Xwedî (Imtiyaz Sahibi) M. Nuri Karakoyun
■ Lijneya Weşanê (Yayın Kurulu):
■ Mazlûm Doğan, Doğan Güzel, İmam Cici
■ Berpîrsiyarê Karê Nivîsaran
■ (Yazı İşleri Müdürü) Abdurrahman Pekedis
■ Navîşan (Yönetim Yeri) İstiklal Cad. Ayhan İşık sokak.19/1 Beyoğlu/ İstanbul
■ Tel: (212) 292 72 70
■ Fax: (212) 251 95 85

■ E-Mail: pinedank@hotmail.com
■ Kargerî (İdare) (212) 251 79 37
■ Çapxane: Aspaş Matbaacılık
■ Yayın Koordinasyon
■ Ada Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd.Şti.
■ Belavirin BİRYAY Dağıtım
■ Nûmergeh: Etlene: (322) 351 42 78
■ İzmîr: (232) 446 19 50 Mîrsîn: (324) 237 66 49

BEQ Ên destê sibê hatine dinyê



Heta niha we xwe di nava gû de digevizand û digot "Ma heval piştî vî emrî ezê çî bikim?" Lê piştî **şoreşa genan**, psikolojiya we xera bû. Hemû 'sözde' planên çem û çem çûn. Êdî dibêjin "Ma heval emrê mirov çawa dirêj dibe? Ma yê min jî dê dirêj bibel?" Hema xwe zêde aciz mîrov çawa bidin me: "Heta ku bawerîya we xwe li dinyayê binihêrin, emrê we nah dirêj bel!"

QUŞXANE Ên berî nivro...



Keçikên delal li xwe miqate bin, van rojan dê xortên çeleng werin xewnên we. Hûnê wekî beranên Dêsta Mişarê yekî hilbijêrin û pê re bizewicin. Lê piştî çend rojên din hûnê ser û qrên bikin û serî li dadgehên serbixwe bidin. Dê ew jî we bis-pêrin dereke din û navê we heta wê dinyayê jî belav bibe. Hûnê bihetikîni! Dema ku hûn jî xewn rabûn, hûnê duayan jî Pineçyan re bikin û bêjin "Xwedê kîri ew remil ravekirina xewnekê ye."

MOZ Ên piştî dana pez



Ev hezar car e hûn dibêjin "ezê di jiyana xwe de rûpeleke spî vekim û bi dest jîneke nû bikim" Lê **rûpelên we jî mîna yên Çillerê, her dem, bi dek û dolabên nûjen tene nivîsandin**. Projeyên we mîna binavkirina Heskîf û Zehugmayê ne Bernameyên we li ser têkçûna xelkê tene avakirin û hebûna we jî wekî OHAL'ê rê li ber civakê digire.

CASHIK Ên ber êvarê...



Babê xalê, wellehî û billehî heqê we xwarine. Hûn jî wekî her kesî diçin mes û mitîngan û wekî her evdê Xwedê hûnjî jî tene binçavkirin û 'îşkence' û lêdanê xwe jî dixwin. **Ka bêjin, ji bo ku hûn di medyayê de derkevin, çî tiştê we kêm e.** Hindik maye ku hûn vîrûsekî biafrînin û genên rojnamegeran biguherînin. Ma em çî bikin, qenî hûn carekê jî demeketin li ser bemaameyekê û **'Reha Mixtar'** ji we re negot "Acî var mi acî?"

ZIRNE Ên nivê şevê...




Ey hevalên pirqedir û buhagiran! P(a)şeroja we baş dixuye. Hûnê wekî Nîsredîn Hoce û kerê wî bi çargavkî berepaskî herin û bînefes bigihêjin heyama Bedirxaniyan. **Celadet Bedirxan** dê we fêr ziman û çanda we bike û **Kamuran Bedirxan** jî dê we hîni huner û dîroka we bike. Ên din jî, dê ji we re qala 'son surecê' bikin. Lê hûn tiştêkî jî jê fêr nakin û bi bayê bezê werin vî alî. Dema ku serê we kevirekî mezin ket dê hiş were serê we.

HUDHUDK Ên heft mehi hatine...



Xwedana vê havînê li pişt stûyê we yê genî re bû lehî û tevî axa jîndar bû. **Evîndara we di hav berjewendiyên kirêt de hêdî hêdî heliya û tevî vî remilê bû.** Biryarên we, wekî gefên Tirkîyeyê di nav du çavan de wînda bû. Hest û ramanên beredayî tevî bawesîna êvarê bûn. Ê ew di nav vir û derewên we yê xef de, ji nîska ve, şiyar bû û zû bi zû korî poşman bû!



Rojnameya fûltonom

KUNDIR

Xwesûya Pîneyê

Hejmar: 3 Piştî Îsa 2000 Xwedî û tiştên din: Faysal Dagli (Li ser navê weşanxaneyê T&T) E-mail: nilamed@go.com

Alfred Nobel wesiya xwe diyar kir:


'XELATA WÊJEYÊ BIDIN KURDAN'

OSLO / Kundirpress - Wesiyeta zanyarê navdar **Alfred Nobel** hate diyarkirin. Di nava wesiyetê de ji bo kurdan surprîzek derket holê.

Wesiyet wiha ye: Nobel berî ku bimire dibêje, "Piştî ku min fêr

kir bi îcadkirina dînamîtê min ediland, min biryar da ku ez pereyê vê îcada xedar dîsa bidim qurbanên wê. Ez çûm remildar. Remildar ji min re got ku wê di sala 2000'an de jî dînamît mala kurdan kambax bike. Wê dijminên kurdan bi dînamîtê welatê wan wêran bikin û zarokên wan bikujin. Loma ez pir li ber ketim. Li ser vê yekê min got, bila xelata wêjeyî a sala 2000'an bidin kurdan.

Remildar ê min got, "Hin nivîskarên ku qaşo kurd in, wê di sala 2000'an de derkevin



piyaseyê." û paşê serpêhatiya wan ji min re got. Min jî got, Baş e, van nivîskarên piştî ku bi xêr û selamet çûn eskeriya xwe kir, teskera xwe stand, bila onbaşiyek ji wan bibe xwediyê


xelatê."

Nivîskarên ku eskeriya xwe kirine, piştî wesiya Nobel bihîstin, serî li PEN'a Kurdan û got, "Kehanet û wesiya xuya ye. Me eskeriya xwe kir. Va ye ji we re fotokopiya teskereya me û sûretên me yê eskeriyê. Hinek ji me bûn onbaşî jî. Her wiha me li eskeriyê gelek taqdirname jî standin. Çiyê me kêm e? Bila PEN, me wekî berendam nîşan bide, emê xelatê jî fiiftî fiiftî par ve bikin. Niha çavê dîrokê li ser kurdan in.

ILAN

- Ez li Leylayê digerim. **Mecnûn**
- Ez li dewleteke bêserokomar digerim. **Sulumen Baba**
- Ez jî li parlamenekî bê serok. **Yasar Kaya**
- Ji bo Bernameya Çözümê sîroveciyên siyasî ku ji pêvajoyê fêr dikin lazim in. **Medya Tv**
- Ev 77 sal e ku em li serokkomarekî/e mîrxas digerim. **T.C**
- Em ji bo pê re şer bikin li dijiminekî digerim. **Artêsa Tirk**
- Em li demokrasîyê digerim. **Neteweya Kurd**
- Em li mişterîya digerim. **Tele Med**
- Min dîploma xwe ya zanîngehê wînda kir. **Bêhukm e. Cahid Merwan**
- Balafirên modern û debabeyên bi zixr lazim in. **Dewleta Etoppayê**
- Xwarin û vexwarin lazim e. **Birçî û taziyên Etoppayê**

NÛÇIK



- Bi diyarbûna nexşeya genan a însanan, zanyaran got ku, "Di laşê tirkan de gena aştiyê tune ye. Me di xwîna wan de li şûna genê aştiyê û demokrasîyê, du caran jê zêdetir genê şer û zordariyê peyda kir. Lewre ji bo ku tirk werin sererast kirin, divê Netewên Yekbûyî biryara emeliyata hemû tirkan bide. Ew jî wê bi salan bidome. (hûn u wîjdanê xwe!)"

-Piştî ku YNK li nêzî Koyê neft derxist û li wir tesfîyexane vekir, li başûr waliyê ku navê wî ne lazim e got, "Di qûna min de neft heye, lê li Koyê tune ye." Piştî daxuyaniya wî, endazyarên neftê ji hikûmeta başûr doza derfeta lêgerîna neftê ji hemû deran kirin. Ger ruxsata lêgerîna bê dayîn, wê rewşa wî çawa be, nayê zanîn. (Ev nûçe ne henek e!)

- Diyar bû ku **Cahid Merwan** nivîsên Kermêşê didize. Merwan di nivîsa xwe yekem a Kundir de slogana "yan mizdan yan bazdan" jî nivîseke Kermêşê diziye. Her wiha Merwan nivîsên xwe yê Kermêşê bi tirkî dinivîsîne û **Bedran Dere** jî bo wî werdigerîne kurdî. Me xwest bila xwendevanên Kermêşê vê yekê bizanibin. (ev nûçe ne henek e!)

%100
KURDÎ

LI AMEDÊ BI NAVÊ ROJ RÛNÊ GULBEROJKÊ DERKETIYE!

pîne

ECÊB E !!
PIŞTÎ KU EV ROJ
DERKET XELKÊ AMEDÊ
DERPÊ JI QÛNA XWE
DERXIST...

GULAŞÊN BI RÛN
ÊN DIYARBEKIRÊ

